# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :984 | 3-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/




Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165


## Çanda abîdeyên li dijî faşîzmê

**Li welatê Yugoslavyaya berê hin abîdeyên ji betonê yên dêwane hene.**

Li welatên Yugoslavyaya berê hin abîdeyên ji betonê yên dêwane hene. Ev abîde ji bo bibîranîna şer û muharebeyên li dijî faşîzma Hîtler hatine avakirin û li cihê wan muharebeyan ew hatine avakirin. Ew ji ber wê gelek caran li deverên dûrî gund û bajaran in. Ev abîde bi navê spomenîk tên zanîn û maneya wan bi zimanên sirb-xirwatî maneya wê abîde ye.




Li ser înternetê gelek caran ji peywendê qut, wêneyên wan tên parvekirin. Ev wêne bi pirranî yên wênegirê Belçîkî Jan Kempenaers in. Tenê weke Spomenîk1, Spomenîk 2 tên bi navkirin û navê cih jî tê hildan, û wiha li ser înternetê tên belavkirin.

Esas bi înîsiyatîfa General Tîto, mîmarên tevgera çandî ya Yugoslavyayê yên weke Duşan Camonya ew çêkirine.

Spomenîks niha veguherîne markeyeke serketî, lê ti kes behsa serpêhatiya wan û peywenda wan nake. Ji ber wê jî niha mîmar û hunermendên ji welatên Yugoslavyaya berê bersivê digihînin van kêmagahiyan.

***Ozgûr Polîtîka***




## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Ambargo** (Fransî) | **1. Qedexekirina firotina malekî li welatekî. (yan ew bifiroşe, yan hin bifiroşinê) Astengkirin, rênedan. Gemaro, hîsar: Amerîka ambargo danî ser Îranê. 2. Astengkirina têkiliya weletekî bi dinyayê re. Gemaro, hîsar. 3. Astengkirina kesekî bi kesên din re. Gemaro, hîsar.** |
| **Diyalog** (Fransî) | Axaftina dudu, yan çend kesan li pêşberî hev. Danûstandin. |
| **Festîval** (Fransî) | 1. Xwepêşandana pîşeyî: Festîvala filman hat lidarxistin. 2. Şahî: Ji bo pîrozkirina Newrozê festîvalek hat lidarxistin. 3. Xwepêşandana ji bo berhemeke binavûdeng ya herêmekê: Festîvala zebeşên Amedê. |
| **Komîn** (Fransî) | Komek ku bi hev re dixebite û hatina xwe par ve dike. |
| **Komîte** (Fransî) | Di asta jêr de çend kesên ji bo kirina karekî, yan meşandina wî, yan nûnertiya saziyekê hatîn erkdarkirin. Licne. |
| **Konser** (Fransî) | Stirangotina hunermendan li pêşberê civakê. |
| **Konsey** (Fransî) | Di asta herî jor de çend kesên ji bo kirina karekî, yan meşandina wî, yan nûnertiya saziyekê hatîn erkdarkirin. |
| **Mihrîcan** (Aryenî) | Festîval. Ereb jî bi kar tînin. |
| **Paradîgma** (Fransî) | 1. Mînak, model, nimûne. 2. Kombûna nirxan. 3. Li gorî hişmendiyekê hêman pîvan û rêgezên jiyana civakê: Rêveberiya Xweser dixwwaze li gorî paradîgmaya Neteweya Demokratîk pergalekê dayne. |
| **Pergal** | 1. Awa û şêweyê kirin û meşandina karekî. Sîstem, nîzam. 2. Amûr, alav. 3. Biserûberî, birêkûpêkî |

## “Cihwarên dîrokî yên mîna Kelha Nebî Horî bi destê dewleta tirkî tên wêrankirin”

**Rêvebera Karkeriya Şûnwaran a herêma Efrînê Esmehan Ehmed bal kişand dîroka kela Nebî Horî ya kevnar û got: “Bajara Nebî Horî xwedî dîrokek kevnar û dirêj e.”**



Efrîn bi dewlemendiya xweza, çiya û şûnwarên xwe yên kevnar tê nasîn. Yek ji wan cihan Nebî Horî ye û di serdemên kevnar de weke bajar dihat nasîn. Nebî Horî bi sê navan tê naskirin Quriş, Sîros û Nebî Horî ye û vedigere serdema Hilenstiyê (Siloqiyê) û navê Quriş jî ji wir tê. Nebî Horî dikeve bakurê bajarê Efrînê û 30 km jê dûr e. Ev bajar di serdemên Hilenstiyê, Roman, Bîzansî û Îslamê de xwediyên cihekî bi wate bû.

Berî 2000 salan du çemên bingehî li herêma Efrîn hebûn û çar pirên bingehî girêdayî vî bajarî bûn lê yên heya niha mane dudu ne. Yek ji wan pira Roman ku çema Sabûn di bin re derbas dibe û ya din jî çemê Efrînê di bin re derbas dibe. Piştî dewleta tirkî herêma Efrînê dagîr kir dest avêt ser şûnwarên Nebî Horî û bi temamî wêran kirin.

**“Nebî Horî xwedîdîrokeke kevnar e”**

Esmehan Ehmed bal kişand ser dîroka bajarê Nebî Horî ku ji serdema Bîzansiyan tê û wiha axivî: “Wek bajarekî tê naskirin du sê navên wê hene, Quriş, Sîros û Nebî Horî. Ev bajar di serdema Bîzans, Roman û Islamê re derbas bûye û li gorî her serdemê navek lê hatiye kirin û berhemên dîrokî tê de hatine zêdekirin. Pira Romanî girêdayî bajarê Nebî Horî ye. Gora olî şeş koşeyî ye ev taybetmendî wê ji gorên din cuda dike û ji du tebeqeyan ava bûye. Di heman demê de di vê bajarê kevnar de dikek heye navê wê jî dika Romanî ye derdor wê jî û tê de şano pêşkêş dikirin. Di vî bajarî de tabloyên mozaîk jî hene ku dîroka wê nîşan didin.”

***JINHA***

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Z | A | L | ■ | S | A | M | Î | ■ |
| 2 | ■ | S | I | B | Ê | ■ | Î | ■ | |
| 3 | A | A | ■ | A | R | D | ■ | P | ■ |
| 4 | B | ■ | K | ■ | T | E | B | A | X |
| 5 | Î | C | A | R | ■ | B | Î | R | ■ |
| 6 | S | ■ | T | E | Ş | Î | ■ | Z | O |
| 7 | ■ | H | O | ■ | Î | ■ | M | Û | ■ |
| 8 | D | E | ■ | A | V | J | E | N | Î |
| 9 | A | B | O | R | ■ | Î | D | ■ | N |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | | | ■ | | | | |
| 2 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 3 | ■ | | ■ | | | ■ | | | |
| 4 | | | | ■ | | | | | ■ |
| 5 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 6 | | ■ | | | ■ | | ■ | | |
| 7 | | | ■ | | | | | | ■ |
| 8 | ■ | | | | | ■ | | | |
| 9 | | | | ■ | | | | | |

### ÇEP-RAST

1. Rengê reşê dibiriqe... Vexwarineke bi alkol
2. Kevok... Bêzar û bêziman
3. Daçekek ku wateyê xurt dike... Xweliya piştî şewatê
4. Kesê ku deng naçê, kesê ku guhê wî nabihîze... Navber, mesafe
5. Elementên ne metal, mîna klor, fosfor û oksîjenê
6. Hevser (mêrê jinekê)... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê
7. Baneşana bêhntengiyê... Paytexta Bolîvyayê
8. Dema mirinê... Madeya ku tenê ji hêmanekê hatiye pê
9. Kurteya rêxistina rizgariya Îrlandayê... Hazir

### JOR-JÊR

1. Ji bo denglêkirina li kesê kal
2. Pênûs... Hejmarên yek, sê, pênc, heft û hwd.
3. Cînavka şexsê sêyemîn ji bo rewşa netewandî... Dijberê rengî spî... Li hin herêman şûna ‘dayik’ê tê gotin
4. Cureyek segê nêçîrê
5. Paytexta Perûyê... Beyreq, sembola welatan
6. Tevgera hewayê... Birayê bavê mirov
7. Pêvek... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin
8. Notayek... Serbest, ne kole
9. Teref... Peyva neyînî... Kurteya elementa hesin



## Jiyan Tolhildan, sembola jina azad û afirînera serkeftinan

Gelek nav lê hatin kirin; afirînera serkeftinan, nimûneya pêşengiyê, parêzvana mafên jinan, stûna şoreşa jinan, şoreşger û şopdara riya birayê xwe yê şehîd. Ev kes şehîd Jiyan Tolhildan e, şehîda nemir ku wê di bîra gelên bakur û rojhilatê Sûriyê de zindî bimîne. ***R-2***


# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 984 | 3-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/


## 03.08.2014

# ROJEKE REŞ Û ŞERM Û SERŞORIYA MIROVAYIYÊ

3`yê Tebaxa 2014`an bû. Ji bo qirkirina civaka Êzîdî zebaniyên dojehê (DAIŞ), zend û bendên xwe pêçabûn. Ev fermana 73`yan bû ku dihat serê vê civaka dîrokî. Lê dixwestin di vê fermanê de bi navê Êzîdiyan tiştek nemîne û ev civaka resen ji dîrokê rabe. Ev zebaniyên rûqirêj, dilgemar û xwînxwar bi qirkirinê têr nedibûn. Diwestin rûmeta vê civakê bişkîn. Di gel kuştina bi sedan jin, mêr, kal, pîr û zarokan, destdirêjî li jinan kirin, revandin û bi hezaran keç û jinên ciwan li bazara koleyan firotin. Hê çarenûsa gelek ji van jinan ne diyar e. Bi pêmana salvegera vê ROJA REŞ, KJK`ê banga ‘xwedîderketina li Şingalê û hesabpirsîna ji sûcdaran kir. ***R-3***



## Li Qamişlo pirsgirêka jeneratoran

Walatiyên bajarê Qamişlo ji ber pisgirikên jeneratorên ji aliyê kesan ve hatîn danîn bêzar bûne. Welatî banga çareseriyê li saziyên têkildar dikin.

***R-6***



## Ji Anka-Derê li dijî asîmilasyonê banga tevlibûna kursan

Anka-Der ku lez daye xebata xwe ya li ser kurdî, ji bo tevlîbûna kursên bêheq bang kir.

***R-7***



## Yên rê bidin Erdogan wê bibin hevparên wî yên sûc

**Zekî Bedran** ***R-4***

## Şingal riya yekane ya çareseriya aloziyên Iraqê ye

**Dilyar Cizîrî** ***R-6***

# Jiyan Tolhildan, sembola jina azad û afirînera serkeftinan

Gelek nav lê hatin kirin; afirînera serkeftinan, nimûneya pêşengiyê, parêzvana mafên jinan, stûna şoreşa jinan, şoreşger û şopdara riya birayê xwe yê şehîd. Ev kes şehîd Jiyan Tolhildan e, şehîda nemir ku wê di bîra gelên bakur û rojhilatê Sûriyê de zindî bimîne.

Em dizanin ku şoreş wek bertekek li hember zordestiyê û ji bo bidestxistina azadî, mafan li dar dikevin. Lê Şoreş 19'ê Tîrmehê şoreşeke hevbeş e û ji yên berî xwe cudatir e. Li aliyekî banga jiyana birûmet, azadî û demokratî dike û li aliyekî din guhertina têgeh û hişmendiya şaş ên li hember jinan armanc dike. Şoreşa 19'ê Tîrmehê bû şoreşek di hundir şoreşeke din de ku bi avakirina rêveberiyeke xweser tacîdar bû û ev modela demokratîk cîhan kir heyranê xwe.

Bêguman, guhertina hişmendiya civakan ne tiştekî hêsan e, lê jina azad tev li hemû qadan bû û bi pêşengiya stûnên şoreşê, gelek gav ber bi pêkanîna armanca xwe ve avêtin. Ji bo parastina destkeftiyan fedakarî kir mîna şehîd Jiyan Tolhildan a ku ji jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê re bû sembol, gelo Jiyan Tolhildan kî ye?

Jiyan Tolhildan li ser şopa birayê xwe yê şehîd meşiya. Selwa Yuisf (Jiyan Tolhildan) li gundê Memala yê navçeya Raco ya kantona Efrînê, sala 1980'î ji dayik bûye. Jiyan di malbateke welatparêz de ku bi têkoşîna xwe ya li ser fikrê rêber Ocalan û Tevgera Azadiya Kurdistanê ji 1980'an ve, tê naskirin, mezin dibe.

Di malbata xwe de, Jiyan şehîda duyemîn a malbatê piştî birayê xwe Elî ye yê ku sala 2005'an di nav Tevgera Azadiya Kurdistanê de şehîd bûye. Di malbata xwe de ku ji 5 birayan û 4 xwişkan pêk tê, Jiyan a çaremîn e. Mabatê ji ber êrişên dagirkirinê yên dewleta Tirk ên li ser Efrînê di sala 2018'an de koçî taxa Şêxmeqsûd a Helebê kir.

Şehîd Jiyan fikrê Tevgera Azadiya Kurdistanê bi rêya bavê xwe nas dike ku ew jî endamê tevgerê bû û derfet ji keç û xortên xwe re vekir da ku tev li tevgerê bibin, yekemîn kes tev li tevgerê bû birayê şehîd Jiyan, şehîd Elî ye ku di 1996'an de tev lê bû.

### Xwedî li banga pîroz derket

Şehîd Jiyan piştî birayê xwe bi 3 salan an ku piştî dîlgirtina rêber Ocalan bi komployeke navneteweyî ku di 1998'an de hatiye plankirin, di sala 1999`an de tev li Tevgera Azadiya Kurdistanê dibe. Şehîd Jiyana bi tevlêbûna xwe di wê demê de xwest bersivê bide hêzên faşîst ku berxwedana wan berdewam e û dev ji rêya şehîdan bernadin.

Têkildarî vê yekê, bavê şehîd Jiyan, Hisên Yûsif wiha anî ziman: "Rizgarkirina welatan erkekî pîroz e ku divê em di oxira wê de tiştên herî giranbiha bikin qurban. Tevî xemgîniya di nav malbatên şehîdan de jî lê îsrar û îradeya wan a tolhildanê hîn xurttir dibin."

Hisên Yûsif wiha domand: "Gava min xwest ez mala xwe ji Tevgera Azadiya Kurdistanê re vekim da ku ez û keç û kurên xwe tev lê bibin, armanca me rastiya gelê Kurd bidin nasîn. Me gelek zor û zehmetî dîtin, têkoşîna ji 1980'an ve û heta niha jî bi wê armancê ye ku em zarok û neviyên xwe ji bindestiyê rizgar bikin. Keça min Jiyan ji bo vê armancê tev li karwanê şehîdên Kurdistanê bû."

### Jiyan piştevana jinan ji zarokatiyê ye

Beriya ku şehîd Jiyan tev li Tevgera Rizgariya Kurdistanê bibe û ji ber ku keça mezin a malê ye, di demeke zû de erkê berpirsyariya xwişk û birayên xwe hildabû ser xwe, ji ber dayika wê Asya nexweş bûbû û nedikarî bilive.

Bi wê re, Jiyan ji bo malbata ji 11 kesan pêk tê, hem dayik û hem xwişk bû. Pêdiviyên malbatê peyda dike û xwendina xwe jî temam dikir. Li hember erkên xwe xwedî berpirsyariyeke mezin bû.

Xwişka şehîd Jiyan Fatme Yusif ku cil û bergê xwişka xwe li xwe kiriye got: "Em biçûk bûn. Timî şîret li me dikir ku serî ji kesekî re netewînin û li hember zehmetiyan hêz û vîn bin. Her tim bi me re eleqedar dibû ji ber ku em biçûk bûn, nedixwest ku birayên me zorê li me bikin. Ji biçûkahiya xwe ve piştavana jinan bû."

Fatme destnîşan kir ku piştî tevlêbûna birayê ya di nav Tevgera Rizgariya Kurdistanê de, Jiyan pirtûk û parêznameyên rêber Ocalan dianîn û di mal de tevî hevala xwe Norşîn dixwendin. Li gorî Fatme bibîr xistî, piraniya mijarên pirtûkan têkildarî rola jinan di şoreşa gelê Kurd li çiyayên Kurdistanê de bû, ev yek bandor li kesayeta Jiyan kiriye ku rê li pêşiya birayên xwe bigire ku di bin nav urf û adetan zorê li wan bikin.

### Di biçûkaniya xwe de mamosteya zimanî kurdî bû

Tevî zehmetiyên peydkirina pirtûkên zimanê kurdî ji ber zordestiya desthilata Baas, lê şehîd Jiyan di 16 saliya xwe de gelek pelik anku kaxizên têkildarî tîpên kurdî û rêbazên bilêvkirina wan, tevî hinek rêziman bi dest xistin. Tiştên ji wan kaxizan fêr dibû, hînî zarokên gund dikir.

Fatme wiha domand: "Tiştek vîna wê nedişikand. Ruxmî ku berpirsyariya wê mezin bû ji ber temenê wê yê biçûk, lê xizmeta mal, dayika me ya nexweş û xwişk û birayên me yên biçûk dikir. Demek jî ji bo zarokên gund vediqetand. Dît ku berpirsyariya gel ji ya malê mezintir e, ji ber wê tev li tevgerê bû."

Têkildarî wê, bavê şehîd Jiyan destnîşan kir ku keça wî di nav zarok û şêniyên gund de dihat hezkirin ku Jiyan ji xwe re kiribûn mînak û got: "Jiyana keçeke îdeal bû û dikarî negengaziyê pêk bîne."

Fatme şeva ku beriya Jiyan tev li tevgerê bibe bi bîr xist û got: "Ew xweştirîn rojên zarokatiya min e. Beriya ku tev lê bibe bi rojekê, agahî da me. Lê nehişt em xew bikin. Ji me xwest em xew nekin û çîrok ji me re gotin. Ji birayên yên biçûk xwest ku çay ji me re çêkin. Di derengiya şevê de em kirin nav nivînan û çû."

Malbata şehîd Jiyan bi bîr xist ku şehîd Jiyan sala 1999`an di merasîma oxirkirina şehîd Ciwan de û gelek ciwanên kantona Efrînê soz dabûn ku çek rakin, ev bûyer tam piştî plana Komploya Navneteweyî ya li dijî gelê Kurd û rêber Abdullah Ocalan bû.

Şehîd Jiyan derdora 13 salan li çiyayên Kurdistanê dimîne û li hember dewleta Tirk a faşîst şer dike. Piştî ragihandina Şoreşa 19`ê Tîrmehê li Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê Jiyan bi lez tev li şoreşê dibe û di şerên parastina Serêkaniyê de ji çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nusra berê) cih digire.

### Yek ji damezrînerên ypj`ê

Piştî destpêkriina Şoreşa 19`ê Tîrmehê û ragihandina rêgezên wê ku jin roleke mezin di danîna wê de lîst, şehîd Jiyan li rex hevalên xwe Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) di 4`ê Nîsana 2013`an de ava kir. Bi vê yekê, YPJ`ê bû hêza jinan a çalak ku jinan û nirxên civakê diparêze. Ji ber tecrubeyên wê di şer de, şehîd Jiyan dibe fermandarê rêveberiya şerên rizgariyê ya YPG û YPJ`ê û tev li şerên parastina Serêkaniyê sala 2012-2013`an, rizgarkirina Kobanê 2014-2015`an û hemleya rizgarkirina Minbicê sala 2016`an dibe. Her wiha salên 2017-2018`an çavdêriya hêzên leşkerî yên taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiye dike, di pêngavên rizgarkirina Baxozê ji DAIŞ`ê, paqijkirina Kampa Holê ji çeteyên DAIŞ`ê sala 2019`an de cih digire û gelek erkên ku ketin ser milê wê pêk anîn, herî dawî dibe fermadara giştî ya Hêzên Antî Teror (YAT).

Xwişka şehîd Jiyan diyar kir ku Jiyan sekna li hember zehmetiyan hez dikir û hewl dida timî serkefitnê pêk bîne, xwedî rêgez bû, kesayeteke wê taybet hebû ku dixwest her tiştî bicerbîne.

### Civata navneteweyî berpirsa şehîdxistina wê ye

Piştî ku ji Foruma Yekemîn a Şoreşa Jinan a li bajarê Qamişlo vedigere, şehîd Jiyan tevî şehîd Roj û Barîn ber bi mala birîndaran ve ketin rê lê balafireke bêmirov a biçek a dewleta Tirk a dagirker li wan da û şehîd xistin.

Têkildarî şehîdxistina şehîd Jiyan û hevalên wê, xwişka şehîd Jiyan Bêrîvan Yusif, got: "Koalîsyona Navneteweyî berpirsa şehîdxistina xwişka min e ku şerê terorê kir. Daxuyaniyê sersaxiyê yên ku rêveberiya Amerîkayê dane, hibir li ser kaxizê ye. Ji ber ku ji bo hesabxwestina ji Tirkiyê tiştek nekir."

Bêrîvan Yusif banga girtina qada hewayî ya herêmê kir da ku êriş û sûcên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî herêmê rawestin û banga berdewamkirina rêya şehîd Jiyan kir.

Şehîd Jiyan Tolhildan morha xwe li dîrokê xist wek jineke azad ku şerê DAIŞ`ê kir, bi ser ket û tev li şoreşê bû û têgehên berê yên li ser jinan guhertin.

Dewleta Tirk a dagirker jinên ku şerê DAIŞ`ê kirine dike hedef. Tişta DAIŞ`ê pêk neaniye, bi rêya balafirên xwe yên bêmirov ên biçek temam dike. Di salvegera 10`an Şoreşa 19`ê Tîrmehê de jinên têkoşer ên ku gelê herêmê ji terorê parast bi êrişeke tirsonak hatin şehîdxistin.

***ANHA***











# Ji Anka-Derê li dijî asîmilasyonê banga tevlibûna kursan

Anka-Der ku lez daye xebata xwe ya li ser kurdî, ji bo tevlîbûna kursên bêheq bang kir.

Komelaya Ziman Çand û Hûnerê ya Ankayê (Anka-Der) ku di meha hezîranê de hat vekirin û ji bilî kurdî xebatên çand û hunerê jî dimeşîne, piştî 6 salan li bajêr yekemîn komele ye ku li ser kurdî dixebite. Anka-Der ku di van demên dawî de bi atolyeyên zaravayên kurmancî û kirmanckî yên kurdî bi kursên baglama, gîtar, tembûr û resimê dest bi xebatên xwe kir, piştî demsala havînê dê lez bide xebatên xwe.

Omer Tûranliyê ku nêzî 10 salin li ser zimanê kurdî dixebite û li Anka-Derê mamosteyê kurdî ye û rêvebirê komeleyê Mehmet Zekî Gonultaş derbarê xebatên komeleyê de agahî dan. Turanli ku di Kurdî-Der a ku di sala 2004'an de hat avakirin ûdi sala 2016'an de bi biryarnameya di hikmê qanûnê (KHK) de hat girtin jî xebitiye, diyar kir ku ew valahiya çêbûye dê bi Anka-Derê re bê dagirtin.

### Wêje û huner

Tûranli anî ziman ku li dijî zextan û polîtîkayên asîmîlasyonê yên li ser zimanê kurdî li ber xwe didin û ew hewl didin ku xisara rû daye pir kêm bikin. Tûranli bi lêv kir ku çendî komele nû hatiye vekirin jî eleqeyeke mezin ji bo wê heye û wiha got: "Ziman tenê bi perwerde û kursan pêş nakeve. Pêşketina ziman girêdayî wêje û hunerê ye jî. Bi dîtina vê rastiyê re em hem xebatên çand û hunerî hem jî xebatên zimanî dikin."

Tûranli diyar kir ku ew dixwazin li ser wêjeya kurdî ya klasîk perwerdehiyê bidin û got: "Dê xebat, xwendin û lêkolînên li ser wêjeya kurdî ya klasîk girîng be. Em ê li ser Feqiyê Teyran û Meleyê Cizîrî lêkolînan bikin û di vî warî de civakê serwext bikin."

### 'Kurdî bila bibe zimanê perwerdehiyê'

Tûranli ku hemû kurdên Enqereyê û meraqdarên çanda kurdî vexwendin Anka-Derê destnîşan kir ku tenê bi kursên ziman pêşketin û parastina kurdî zehmet e û ew daxwaz dikin ku demek berî demekê zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyê. Tûranli, di dawiyê de diyar kir ku divê kurdî pêşî li malan berbelav bibe.



### Kurs bêheq in

Ji rêveberên Anka-Derê Mehmet Zekî Gonûltaş jî bertek nîşanî qedexekirina ziman, huner û çanda kurdî da û got: "Çend meh berê konserên hunermendên kurd hatin betalkirin. Zimanekî li ber windabûnê û tê xwstin bê asîmlekirin heye. Ji ber vê sedemê tu xebatên me yên çand û hunerê ne biheq in. Em bi tevahî li ser bingeha dilxwazî û hevgirtinê dixebitin."

### Daxwazî zêde ye

Gonûltaş anî ziman ku bi bajarîbûnê re kurdî bûye zimanekî kêmaxêv û wiha domand: "Ji bo zindîbûna zimanan divê em têbikoşin. Bi milyonan zarokên kurd nikarin li dibistanê fêrî zimanê xwe bibin. Komeleyên bi vî rengî li dijî windabûna zimanan tên vekirin. Dema cihekî wiha tê vekirin gel gelekî kêfxweş dibe. Daxwazek cidî heye. Em li ser dîroka kurd û Kurdistanê jî plana hevdîtinan dikin. Em ê li ser esasê ziman û çanda dengbejiyê jî bixebitin."

### Bangewazî

Gonultaş di dawiya axaftina de wiha axivî: "Komele îlhamê dide gelê kurd. Komele ji asîmîlasyonê re bersiveke baş e. Berpirsiyariya me heye ku em zimanê xwe geş bikin û veguherînin. Neaxfitina bi zimanê xwe travmayeke mezin e. Ji bo ku zimanê kurdî ji holê ranebe têkoşîn divê. Banga me ji bo gel; bila li malê bi zarokên xwe re bi kurdî biaxivin û zimanê xwe biparêzin."

***MA***

# Li Tebqa komxebata yekê ya Wênexêzên Paşrojê

**Komîteya Çand û Hunerê bi hevkariya Nivîsgeha Wênexêziyê ya Tebqa komxebata yekê ya zarokan ya "Wênexêzên Paşrojê" li Hola Navenda Çand û Hunerê ya bajarê Tebq, orgenîze kir.**

Nûnerên Rêveberiya Sivîl, Meclisa Leşkerî, partiyên siyasî, nivîsgehên jinan, Yekitiya Jinên Ciwan û Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Sûriyê yê Tebqayê beşdarî komxebatê bûn.

Endamê Navenda Çand û Hunerê Amir El-Înad bi xêrhatina zarokên beşdarî komxebatê bûne û mêvanan kir.

25 zarokên temenên wan di navbera 6 û 16 saliyê de tev li komxebatê bûne û behreyên xwe yên wênexêziyê nîşan didin.




Di roja yekemîn a komxebatê de zarokan talboyên cuda xêz kirin, ji wan ên sewalan û xwazayê.

Têkildarî hûrgiliyên komxebatê hevserokê Komîteya Çand û Hunerê ya Tebqayê Elî Elaya ji ajansa me re axivî. Elaya komxebat ku yekemîn car e li herêmê tê lidarxistin, li Wênexêzên Pêşerojê pîroz kir û serkeftin ji zarokan re xwest.

Elaya anî ziman ku armanca komxebatê, pêşxistina aliyê hunerî û çandî ye da ku xwe bigihînin beşekî mezin ê hunermend û rewşenbîran.



Tê payîn ku komxebat 3 rojan dewam bike. Di roja yekemîn û



duyemîn de dê zarok tabloyan xêz bikin û di roja sêyemîn de dê tabloyên wan werin pêşandan.

***ANHA***

# Şahiya orkestraya zarokan

**Peymangeha Orkestra Rojava ya Zarokan beşa enstrûmentên têlî û piyano û koma stiranan şahiyek li navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya Qamişlo, li dar xist.**

Peymangeha Orkêstra Rojava ya Zarokan beşa enstrûmentên têlî û piyano û koma stranan şahiyek li navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya Qamişlo, li dar xist.

Di şahiyê de bi dehan zarok û malbatên wan hazir bûn. Di destpêka şahiyê de endama rêveber a peymangeha Orkêstra Rojava ya Zarokan Mizgîn Tahir bixêrhatina beşdaran kir. Piştre koma stranan sirûda Kurdî (Ey Reqîb) xwend û parçeyên muzîkî ji aliyê koma enstrûmentên têlî û piyano ve hatin pêşkêşkirin.

Têkildarî şahiyê, endama rêveber a peymangeha Orkêstra Rojava ya Zarokan, Mizgîn Tahir got, ku kom ji 30 zarokî pêk tê û anî ziman ku ew ê komê mezintir bikin û enstrûmentên nû zêde bikin û stranên nû amade bikin.

Mizgîn Tahir anî ziman ku



armanca wan ji şahiyê ew e ku behreyên hunerî yên zarokan vebînin û pêş bixin. Şahiya orkestraya zarokan bi xelatkirina sê zarokan ji komê bi dawî bû.

***ANHA/QAMIŞLO***

# Li Qamişlo pirsgirêka jeneratoran

Walatiyên bajarê Qamişlo ji ber pisgirikên jeneratorên ji aliyê kesan ve hatîn danîn bêzar bûne. Welatî banga çareseriyê li saziyên têkildar dikin.

**Xalid Etê/Qamişlo**

**Rewşa kehrebeyê li Sûriyê piştî sala 2011`an**

Li Sûriyê berî 2011`an 14 stasyonên keherebê hebûn. 11 stasyon li ser gaz û sotemeniyê kar dikirin, 3 jî li ser bendavan. Di encama şer de stasyona Heleb, Idlib û Dêrazorê bi temamî hilweşiyan. Herwisa Stasyona Mehereda, Zare û Tişrîn zirar dîtin.
Herwisa yek ji çavkaniyên sereke yên berhemanîna Keherebeyê li Sûriyê, bendav bûn. Li Sûriyê sê bendav hene, Bees, Tişrîn û Tebqa. Her sê li ser çemê Firat hatine çêkirin, ji ber têkçûna hin Amûrên bendavê di şer de, herwisa qutkirina avê ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker ve, berhemanîna bendavan pir lewaz bû.
Li gorî daxuyaniyeke Wezareta Kehrebê ya hikûmeta Şamê ya sala 2021`ê, ji bo jinûve avakirina sîstema kehrebê pêwîstî bi 2.4 milyar dolarî heye.

Li gorî amarên hikûmeta Şamê berhama welat ya Kehrebê ya sala 2011`an 41.772 Gêga wat/Saetê bû, di dawiya sala 2021`an bû 24.959 Gêga wat/saetê.
Rewşa Xerab ya Kehrebê ji sala 2011'an ve li Sûriyê bi giştî bi awayekî dijwar bandor li jiyana welatiyan kiriye. Piştî Şoreşa Rojava sîstema Rêveberiya Xweser li bakur û rojhilatê Sûriyê çiqasî hevildanên sererastkirinên vê wêrankariyê kiribin jî, di asta pivîstiyên gel pêşevazîkirinê de kêm ma. Ji bo ku piskirika kerebê ya gelê bakur û rojhilatê Sûrî heta astekê bê çareserkirin, hevildanên şaredarî û kominan çêbûn. Di taxade de jenaretor bi cihkirin jî çareseriyek ji van bû. Lê ji ber ku jenaretorên taxa piraniya xwe girêdayî kesayeta ne û ji aliyê saziyên peywandar nayê şopandin, heya asta pêvîst ne bû bersiva pêvîstiyên gel. Ev yek pir caran bû sedemê acizbûna gel.

**Li Qamişli jenator**

Li Qamişlo jî sîstema Jenatorên hevpar yên taxa hat danîn. Niha li gorî amarên fermî yên Rêveberiya Xweser 490 jenatorên hevpar li Kantona Qamişlo hene. Li gorî komîteya sotemeniya kantona Qamişlo 3 milyon 169 hezar û 750 lîtreya mazot li ser jenaretorên kantonê tê belavkirin û bahayê litreya mazotê jî 85 lîrayê sûriyê ye. Ji bo rêxistinkirina karê Jenatoran Desteya Rêveberiya şaredariyên herêma Cizîrê 9`ê Tîrmeha 2020`an birayar da ku amûrên kontrolkirina li ser jenatoran bê dayîn. Li gorî vê biryarê, wê keherbaya jenatoran bi kîlowat bê firotin û kîlowata wê di saetê de, 10 lîreyên Sûrî bin. Lê ev birayare heya niha nehatiye pêkanîn. Niha jî ji bo 8 saetên keherbaya janatorê, buhayê Ambêr yê mehane 5 hezar lîreyê Sûrî ye.



**Jenatorên hevpar ji çareseriyê zêdetir piskirikê kurtir dike**

Ji ber qutbûna kerebeya giştî ku rojêherî zêde 2 saetan tê, jenator wek çareserî hatibûn rêxitinkirin. Lê pirsgirêkên wan yên teknêkî, ji dervî zirara wan ya li jîngehê, li gorî welatiyan, jenetor bi vî sistemê xwe ji pêvîstiyên wan re ne bû bersiv.

Li gor agahiyên me ji welatiyan hatîn girtin, xwediyê jenatoran ne li gor sîstmekê diyar û pêvîstiyên taxa tevdigerin. Li gorberjevendiyênxweyên şexsî û keyfî kar dikin. Dema ku jenaretorên hin texa xirab dibin, hin car bi mehane ew jenarotor nayên çakirin û nakevin xizmeta gel. Ev jî dibe sedemê acizbûnekê mezin ya walatiyan.
Herwiha li gorî agahiyên me ji xwediyên jenarotoran girtin jî, zehmetiyên ku ew jî dijîn; ne peydakirina parçeyên jenerotor û kêmbûna mazot e.

**Saziya Têkildar Çi dibêje?**

Li ser pirsgirêka jenerotoran Endemê mekteba Jenatoran ya şaredariya Qamişlo Xalid Cuma ji me re diyar kir ku sedemên xirabûna jenarotoran ya herî bingehî germa zêde û kalîteya mazotê û rûn e. Herwiha da zanîn ku parçeyên janetoran biha ne û kêm tên peydakirin.
Xalid Cuma ji derveyê van zehmetiyên ku xwediyê jenarotor dijî da xuyakirin ku hinek ji wan rast nêzî karê xwe nabin û tinê ji bo zêdetir pereyan bi dest bixin astengiyan ji gel re derdixînin û pêvîstiyên kerebeya taxê pêk nayinin. Herwiha Xalid Cuma diyar kir ku divê kominên taxa xwe berpirsyarên vê piskirika kerebê bibînin û ji bo çareserkirinê divê tev bigerin.

## Koçberên Serê Kaniyê li ser ihtimala destwerdanên lezgîn tên perwerdekirin

**Di çarçoveya amadekariya gelê herêmê ji bo bersiva êrişên dewleta tirkî ya dagîrker de, koçberên Serê Kaniyê berê xwe didin navendên tenduristiyê û tevlî dewreyên destwerdanên muhtemel yên lezgîn dibin.**

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 6`ê Tîrmehê de rewşa awarte ragihand û bang li welatiyan kir ku di çarçoveya bersivdayîna êrişên artêşa Tirk a dagirker de tev li dewreyên destwerdanên lezgîn bibin.
Têkildarî mijarê Nivîsgeha Tenduristiyê ya Kampa Serêkaniyê ya li bajarê Hesekê banga rêveberiyê bi cih anî û ji koçberên kampê re dewre vekir.

Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê nexweşxane û navendên xwe yên tenduristiyê jî amade kirin, her wiha li gund û navçeyan ji gelê herêmê re dewreyên destwerdanên lezgîn vekirin.
Gerînendeyê Nivîsgeha Tenduristiyê ya Kampa Serêkaniyê Dilawer Mihemed Elî destnîşan kir ku koçberên ji herêma Serêkaniyê li navendên tenduristiyê yên girêdayî Nivîsgeha Tenduristiyê ya Kampa Serêkaniyê, rojê du saetan li ser destwerdanên bingehîn tên perwerdekirin.

Dilawer Mihemed Elî diyar kir ku ew ê li ser banga Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hefteyekê koçberên li kampê li ser destwerdanên lezgîn, perwerde bikin da ku di rewşên awarte de amade bin.



Dilawer Mihemed Elî destnîşan kir ku ew ê hemû koçberên li kampê li ser du beşan perwerde bibin û her beşek wê ji 25 kesan pêk were.
***ANHA***



### Şingal riya yekane ya çareseriya aloziyên Iraqê ye

**Dilyar Cizîrî**

Di van rojan de ku li Şingalê salvegera komkujiya 3'yê Tebaxê ye, em dinêrin li Iraqê aloziyeke siyasî ya mezin pêş dikeve. Gelê Iraqê xwepêşandanan li dar dixie û li dijî saziyên dewletê li ser piyan e.

Ev geşedanên li Iraqê ne tiştekî nû û tesaduf in, xwe dispêrin kausa li seranserê herêmê ku di encamê de "Bihara Gelan" dest pê kir. Valayiya siyasî ya li Iraqê piştî sala 2003'yan dema roxandina rêjima Be's kûrtir bû, heta niha jî hêzên Iraqê nikarin riyên çareseriyê peyda bikin.
Mînaka wê di mehên dawî yên sala 2021'ê de hilbijartin hatin lidarxistin û hewldana avakirina hikûmetê hat kirin. Lê aliyên siyasî nikarin hikûmetê ava bikin. Ji bo mijara serokatiyê jî heta niha li hev nekirine. Ev alozî her ku diçe kûrtir dibe û ber bi xetimînê ve diçe. Tirs heye ku ev rewş ber bi şerê navxweyî ve jî biçe. Jixwe rewşa li Iraqê li başûrê Kurdistanê jî derbasdar e.
Eger em ji parçebûna Hewlêr û Silêmaniyê bigirin, heta koçberiya bi hezaran ciwanên Başûr di van salên dawî de, herwiha êriş û dagîrkeriya dewleta Tirkan ya li dijî Başûr. Ev xelên me rêz kirîn, bûne sedema gendeliya siyasî û xetimîna siyasî li herêmê. Ev jî cesaretê dide dewletên herêmî yên weke Tirkiye û Îranê destwerdanê li karûbarê Iraqê yên navxweyî zêde bikin. Her kes jî dibîne ka çawa serweriya Iraqê tê binpêkirin.
Her du welatên cîhanê li Iraq bi riya wekîlên xwe dest avêtine vî welatî. Yê ji vê destwerdanê zirarê dibîne jî gelê Iraqê ye. Em dibînin aboriya gel her ku diçe xirabtir dibe û bêewlebûn li seranserê welat serdest dibe.
Di vê rewşa me behs kirî de pêwîst e em careke din vegerin komkujiya 3'yê Tebaxa sala 2014'an ya Şingalê. Di vê komkujiyê de bi hezaran kes hatin kuştin û revandin. Ev jî yek ji berhemên rewşa giştî û gendeliya heyî ye. Ew encama destwerdana dewleta Tirkan û hevkariya aliyan bi wan re bû.
Tişta balkêş xelkên Şingalê piştî komkujiyê û di çarçoveya xweparastinê de êş û zehmetî avêtin milekî, herêmên xwe rizgar kirin û sîstema xwe ya xweser ava kirin. Di her qada jiyanê de xwe bi rêxistin kirin. Aliyên siyasî yên hundir û derve ku naxwazin aloziya Iraqê û başûrê Kurdistanê çareser bibe, bi tevayiya hêza xwe ketin dewarê û li dijî rêveberiya Şingalê plan û êriş dan destpêkirin. Peymana 9'ê Cotmehê jî mînaka wê ya berdewam e.
Lewra ew alî baş dizanin sîstema li Şingalê riya yekane ya çareseriya tevayiya aloziya Iraqê ye. Ancex bi mînaka Rêveberiya Xweser ya Şingalê dikarin aloziyê çareser bikin. Wiha jî wê gelê Iraqê bikare rê li gendeliyê bigire û pirsgirêkên xwe yên heyî çareser bikin.
Ji bo wê jî pêwîst e xwepêşanderên Iraqê yên li dijî gendelî, destwerdan û komkujiyên dewleta Tirkan dadikevin qadan û baş bizanin riya yekane ya çareseriya aloziyên Iraqê û başûrê Kurdistanê mînaka Şingalê ye.



# Dêbavên şehîdan li ser çekan xwe perwerde dikin

Dayîk û bavên şehîdan li banga Rêveberiya Xweser û QSD'ê ya berxwedanê û tedbîrgirtina li dijî êrişên dagîrkeriya tirkî, xwedî derketin. Li Qamişlo malbatên şehîdan ji bo piştgiriya hêzên leşkerî û parastina destkeftiyan dest bi perwerdeya çekan kirin.

Welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê israra xwe ya ji bo berxwedana li hemberş êrişên dagîrkeriya Tirkan careke din nîşan dan. Di çarçoveya rewşa awarte de ku Rêveberiya Xweser 6'ê Tîrmehê ragihandiye, ji bo rûbirûbûna êrişên dagîrkeriya tirkî, tedbîran digirin.

Li Qamişlo dayîk û bavên şehîdan dest bi perwerdeya çekan kirin da ku li kêleka hêzên xwe yên leşkerî li hemberî artêşa tirkan a dagîrker û çeteyên bisekinin.

**Perwerdeyên bikaranîna çekan ji bo rûibrûbûna êrişan**



Dayika şehîd Basil Silêman, Fadye Silêman anî ziman ku perwerdeya wan dê sê rojan dirêj bike, da ku fêr bibin çawa çekê bi kar bînin ji bo li hember êrişên dagirkeriya Tirk û li kêleka hêzên xwe yên leşkerî bisekinin.
Fadye Silêman wiha domand: "Niha em fêrî hilgirtina çekê û çawaniya bikaranîna wê, dibin. Her wiha em li ser destwerdanên lezgîn jî perwerde bûn, ev tişt di qonaxa bê de ji bo têkbirina êrişên dagirkeriya Tirk pir girîng in."

Fadye Silêman destnîşan kir ku piştgiriya wan bi hêzên leşkerî re berdewam e û bang li hemû dayikan kir ku li ser bikaranîna çekê xwe perwerde bikin ji bo têkbirina êrişên dagirkeriya Tirk û got: "Ji destpêkê ve me soz da şehîdên xwe ku em xaka xwe bernadin, niha jî em soza xwe nû dikin ku ruxmî hemû rewşan jî dê îradeya me neşike."

**Her kes dibe şervan**



Birayê şehîd Umer Îbrahîm û endamê Meclisa Malbatên Şehîdan, Ebdulqadir Îbrahîm, wiha anî ziman: "Divê em xwe li ser bikaranîna çekan perwerde bikin, divê em hemû tev li şerê gel ê şoreşgerî bibin û her yek ji me bibe şervan li hember dijmin."
Îbrahîm wiha domand: "Em ê di qonaxa bê de, sûdên mezin ji van amadekariyan bigirin, hem ji bo parastina şêniyan hem jî ji bo berxwedana li hember êrişan li kêleka hêzên me yên leşkerî bin. Ev şer dê ne wek ên berê be, em ê berxwedanê bi îradeya şehîdên xwe bidomînin û bi hemû hêza xwe şerê dijmin bikin."

**Amadekariya ji bo parastina xak û rûmetê**



Têkildarî mijarê, xwişka şehîd Ebdulselam Mihemed Ehmed û endamê Komîteya Ciwanan a Meclisa Malbatên Şehîdan a Qamişlo, Şîrîn Mihemed, wiha axivî: "Di perwerdeya xwe de em fêr dibin çawa li hember êrişan bisekinin, xwe û xaka xwe biparêzin."
Şîrîn Mihemed bang li ciwanên Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir ku li hember êrişên dagirkeriya Tirk bi yekrêzî bisekinin.

**Parastina xwe û zarokên xwe ji faşîzmê**

Der barê girîngiya perwerdeya li ser çekê de di vê qonaxê de, hevjîna şehîd Daar El-Cerbûi, Fatme El-Casim diyar kir ku ew



ji bo parastina xwe û zarokên xwe, tev li perwerdeya bikaranîna çekan dibe got: "Li dijî me êrişên hovane ji aliyê dewleta Tirk a faşîst ve pêk tên."

Fatme El-Casim da zanîn ku divê di hemû aliyan de êrişên dagirkeriya Tirk werin têkbirin û got: "Em ê amade bin destekê bidin keç û xortên xwe yên li eniyên şer û li kêleka wan çekê hilgirin û xaka xwe biparêzin."
Di dawiya axaftina xwe de, Fatme El-Casim bang li hêzên navneteweyî kir ku qada hewayî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo rawestandina êrişên dagirkeriya Tirk, bigirin.
***ANHA***

## El-Zewahirî li Efxanistanê ji aliyê Amerîka ve hat kuştin

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Serkêşê EL-Qaîde Eymen EL-zewahirî ji aliyê hêzên Amerîkî, ve li Kabla paytexta Efxanistanê hat kuştin.**

Medyaya Amerîka Şeva 1`ê Tebaxê li ser zimanê serokê welat Joe Biden eşkere kir ku hefteya derbasbûyî hêzên Amerîkî li Efxanistanê di operasiyonekê de cîgirê berê yê Osame Bin Ladin û Serkêşê piştî wî yê El Qaîde Eymen Zewahêrî kuştine.
Medyaya Amerîkî herwisa ragihand ku Eymen El-Zawahirî, serkêşê El Qaîdê li Efxanistanê, di êrîşeke drona de ku ew dron di destê CIA tenê de heye, li taxa dîplomatîk ya navenda paytext Kabûlê hatiye kuştin.

Hêjayî gotinê ye ku Zewahirî ji xelkê Misrê ye û sala 1951`ê ji dayîk bûye. Piştî kuştina Bin Ladin ya 2011`an, bûbû Serkêşî EL-Qaîde.



## Di dema AKP'ê de 978 girtiyan jiyana xwe ji dest da

**Hevserokê ÎHD'ê yê Enqere Fatîn Kanat diyar kir ku di dema desthilatdariya AKP'ê de 978 kes li girtîgehan mirin û got, "Ev bîlançoyeke tirsnak e. Cihê şermê ye."**

Li girtîgehên Tirkiyeyê bi giştî 314 hezar û 502 girtî û hikumxwar hene. Bi qasî ku ÎHD'ê tespît kiriye, 604 ji wan giran herî kêm hezar û 605 girtî nexweş in û nikarin li girtîgehê bimînin. Gelek ji girtiyên nexweş ji ber nebûna derfetên paqijiyê, nebûna xwarinê yan jî tedawînekirinê, jiyana xwe ji dest dan. Her roj girtiyek bi gumanbarî li girtîgehan jiyana xwe ji dest dide. Ji raya giştî re jî tê gotin ku 'xwe kuştiye' yan jî 'ji ber pirsgirêkên tenduristiyê' miriye. Li gel serlêdana gelek sazî, parêzer û malbatan jî mirina bi guman a girtiyan heta niha nehatiye lêkolîn û mijar hatiye nixumandin.

**Di nava 20 salan de 978 kesan jiyana xwe ji dest dan**

Ji sala 2002'an û vir ve ku AKP bû desthilatdar, li girtîgehan 978 kesan jiyana xwe ji dest dan. Li gorî salan, hejmara girtiyên li girtîgehan jiyana xwe ji dest dan wiha ye:

**Fatîn kanat: bîlançoya şermê ye**

Hevserokê Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) Şaxê Enqereyê Fatîn Kanat ji ANF'ê re axivî û got, "978 kes hejmareke gelekî zêde ye. Bêguman hinekan ji ber nexweşiyê jiyana xwe ji dest dan, lê belê ji bilî wan bi taybetî ji salên 2010'an û pê ve gelek mirovan ji ber kiryarên xerab û êşkenceya li girtîhan û mirina bi guman, jiyana xwe ji dest dan. Lewma ev bîlanço bîlançoyeke gelekî tirsnak e. Ji aliyê mafên mirovan ve bîlançoyeke welê ye ku nikare bê vegotin. Bîlançoyeke şermê ye. Mixabin ne bîlançoyeke ku li pratîka vê dewletê nayê."

**Nîşana şêweyê rêveberiyê ye**

Kanat bal kişand ser rewşa girtiyên nexweş û got, "Carna li ber mirinê têne berdan, carna jî ya li odeyeke nexweşxaneyê yan jî li revîreya girtîgehekê jiyana xwe ji dest didin. Ev kiryarên li girtîgehan; êşkence, mirina ji ber êşkenceyê, lêgerîna tazîkirî, destdirêjiya zayendî, cezayên



dîsîplînê, astengkirina hevdîtinên parêzer û malbatan, polîtîkayên tecrîdê; ev hemû nîşaneya şêweyê rêveberiya welêt a li girtîgehan radixe pêş çavan."
Fatîn Kanat anî ziman ku weke ÎHD'ê ew li ser rewşa girtiyên nexweş û mirina bi guman a girtiyan raporan amade dikin û got, "Em di vê der barê de notê li dîrokê û paşerojê datînin." Kanat diyar kir ku ew dixwazin rewş ji aliyê heyeteke serbixwe ve bê lêkolîn, lê belê bersiv ji vê daxwaza wan re nayê dayin.
***ANF***

# ’Dagîrkeriya tirkî li pêş hêza jina azad têk çûye’

Roksan Mihemed diyar kir ku li hemberî êrişên dagîrkeriyê wê têkoşîna xwe xurttir bikin û got, emê tolê hilînin û şoreşê biparêzin

**Mihemd Xanim-Qamişlo**

Li kelêka gefên dagîrkirina herêmên nû, êrişên dewleta tirkî ya dagirker li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dewam dikin. Bi taybetî êrişa ser pêşengên şoreşê bi balafirên bêmirov zede bûye.

Herî dawî 22`yê Tîrmehê balafireke bêmirov ya biçek ya dewleta tirkî ya dagîrker li ser riya Qamişlo êrişê erebeyekê kir û di encamê de sê fermandarên jin yên QSD û YPJ’ê; Jiyan Tolhildan, Roj Xabûr û Barîn Botan şehîd bûn. Li dijî van êrişên dewleta tirkî gelê herêmê helwesteke tund nîşan dide û ji ber ku qada hewayî ji êrişên dagîrkeran re vekirî dihêle, Koalisyona Navneteweyî berpirs dibîne. Li ser êrişên dewleta tirkî û şehîdxistina her sê fermandarên YPJ’ê, Berpirsa Ofîsa Têkiliyên Giştî yên Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) Roksan Mihemed ji me re axivî.

Roksan Mihemed diyar kir ku ji ber têkçûna dewleta tirkî ya dagîrker li tevayiya qadan, pêşengên şoreşê dike amanc û wiha got: “Şehîdxistina pêşengên şoreşê karekî bêexlaqî ye û ji tevayiya pîvanên mirovayiyê dûr e. Dewleta tirkî ya dagîrker di hundirê xwe de di kirêzên dijware de derbas dibe. Ji bo veşartina van kirîzan, li aliyekî êrişî çiyayên azad dike, li aliyê din êrişî şoreşa Rojava dike. Di dema dawî de dagîrkerî bi tevayiya hêz û çekên xwe êrişî gerîlayên azadiyê kir. Tevî ku çekên kîmyayî jî li dijî gerîlayan bi kar anîn, derbên giran xwarin û rojbiroj bin dikeve. Ji ber binketina xwe ya li çiyayên azad, bi awayekî hovane êrişî bakur û rojhilatê Sûriyê dike.”


## ’Dagîrkeriya tirkî bi êrişan dixwaze tola çeteyên DAIŞ’ê hilîne’

Roksan da zanîn ku şehîdxistina her sê fermandaran ji aliyê dagîrkeriya tirkî ve, hilanîna tola çeteyên DAIŞ’ê ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Piştî têkçûna çeteyên DAIŞ’ê li herêmê, dewleta tirkî bi awayekî yekser ket dewrê û li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyû êrişên xwe zêde kirin. Herwiha erdîngariyêke fereh dagîr kir. Tirkiyê her tim hincetên cuda çêkirin û êrişên xwe zêde kirin. Herwisa li dijî gelên herêmê şerê istixbarat û teknîkê meşand. Tirkiyê di salên dawî de li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê rêbazên qirêj bi kar anîn û bi awayekî gelek dijwar êriş kir. Êrişên wê yên hovane heta îro jî dewam dikin “

## ’Jina azad afrênera civak û jiyana azad e’

Roksan da xuyakirin ku di salvegera 10`an ya şoreşa Rojava de û piştî Foruma Şoreşa Jinan, 3 jinên pêşeng bûn amanac û wiha got: “Wek encama bêtehemuliya dewleta tirkî ya ji şoreşa jinan re, dagîrkeriyê li dijî her sê fermandarên YPJ’ê êriş pêk anî. Hêzên desthilatdar û di navê de Tirkiye ji hêza jina azad ditirsin. Lewra dizanin eger jin azad bibe wê civak , mirov û welat jî azad bibin. Bingehê azadiya civakê têkoşîna azadiya jinan e. Kesayeta jina azad ku li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tê avakirin, di bingeh de ji bo seranserê herêm û cîhanê mînak e.”

## ’Li şûna peyama sersaxiyê ezman li ber balafirên Tirkan bigirin’



Roksan da zanîn ku pêwêst e Koalisyona Navneteweyî erkê xwe yê exlaqî pêk bîne û wiha got: “Piştî şehîdxistina 3 jinên pêşeng, Koalisyona Navneteweyî peyama sersaxiyê da. Peyamên sersaxiyê tenê yan jî gotinên ku dibêjin em li gel hev in, emê têkoşîna xwe ya hevbeş bidomînin, têrê nake. Pêwîst e li dijî êrişên Tirkiyê helwesteke tund nîşan bidin û qada hewayî li ber balafirên wê bigirin. Di demekê de ku çeteyên DAIŞ’ê hewl didin ji nû ve xwe bi rêxistin bikin, dagîrkeriya tirkî êrişên xwe yên ser herêmê zêde dike.

Êrişên wê dikevin xizmeta çeteyan û ji her kesî re eşkere bûye ku destekê dide wan.”

Berpirsa Ofîsa Têkiliyên Giştî yên Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) Roksan Mihemed soza standina tola şehîdan da û axaftina xwe wiha qedand: “Emê tola van hevalan hilînin. Bi xurtkirina hevgirtina xwe, emê bikarin êrişên nû têk bibin û herêmên xwe rizgar bikin. Tişta ku dikeve ser milê me helbet emê bi cih bînin. Emê vê şoreşê biparêzin. Têkoşîna wan hevalên ku bi wê coş, moraleke mezin û bi ruhê fedayî beşdarî xebata her qadê bûn, erkê me ye ku em vê temam bikin “

## Yên rê bidin Erdogan wê bibin hevparên wî yên sûc



**Zekî BEDRAN**

Piştî civîna Tehranê Erdoganê faşşît dibêje divê Amarîka ji rojhilatê Firatê derkeve. Li gorî wî hebûna Amerîka pirsgirêkê kûr dike. Çima bila Amarîka ji Sûriyê derkeve? Ti kes vê pirsê ji Erdogan nake. Ji bo ku Erdogan dijberê dagîrkeriyê ye û dijemperyalîst e dibêje bila Amarîka derkeve? Bêguman na. Tersê wê ji bo ku Erdogan dagîrker û qirker e vê dibêje. Li gorî wî hebûna Amerîka karê wî zehmet dike. Eger Amerîka derkeve wê hêsantir bikeve rojhilatê Firatê, Kurdan qir bike û rêveberiyên xwe ser ji meydanê rake.

Lê dema Amerîka li wir jî êriş dikir. Bi lihevkirina bi Trump re Girê Spî û Serê Kaniyê dagîr kirin. Ew herêm jî ji çeteyan dagirtin û berdan ser serê gel. Li herêmên dagîrkirî ne Kurd man, ne jî destkeftiyên bi navê demokrasiyê. Yên Erdogan wiha bêpakî dikin siyaseta Amerîk û Rûsya ye. Rûsya di êrişa ser rojhilatê Firatê de piştgiriya Tirkiyê kir. Herwiha ya Efrîn ji dagîrkeriyê re vekirî Rûsya bû. Amerîka jî erê kir. Eger ev her du dewlet nexwazin Erdoganê faşîst nikare fermana dagîrkeriyê bide. Hêzeke wisa ya Tirkiyê nîne.

Qaşo herêmên xweser li hemberî yekbûn û yekîtiya Sûriyê gef in. Kê Tirkiye parêzvaniya yekbûn û yekîtiyê dike. Li hemberî vê mirovê bikene, bigirî mirov dimîne şaş. Pêvajoya Astana bi hevbeşiya Rûsya û Îranê pêş ket. Bi saya pêvajoya Astana Tirkiyê dagîrkeriya xwe ya li Sûriyê mayînde û rewa kir. Îranê jî qaşo gotiye bila Amerîka ji Sûriyê derkeve. Baş e Tirkiye li Sûriyê li çi digere? Kê Tirkiye vexwendiye? Tirkiye, ji bo seranserê herêmê û dinyayê bûye navenda gefan. Rêxistiên weke DAIŞ, El Qaîde, El Nusra û bermayiyên wan li herêmên di binê dagîrkeriya Tirkiyê de hespên xwe dibezînin. Bi dilê xwe bi cî dibin, xwe bi rêxistin dikin, perwerdeyê dibînin û aboriya xwe pêş dixin. Ti kes van herêman kontrol nake.

Dewleta tirkî dagîkeriyê bes nabîne. Bi nifûsê dilîze. Malbatên wan çeteyan û yên dixwaze tîne bi cî dike. Li hemberî artêşa Sûriyê bi navê Artêşa Neteweyî ya Sûriyê artêşekê ava dike. Hikumetên demî ava dike. Weke din diravên tirkî bi kar tên. Dibistanên tirkî vedibin. Zimanê tirkî bi zorê bi ser wan de disepînin. Waliyan dişîne wir. Ev tev amadekariya wî qasî ne ku van herêman bi ser Tirkiyê ve bike.

Kesên weke El Bexdadî û Qureyşî yên serkêşên DAIŞ’ê li herêmên dagîrkirî hatin kuştin. Ya ku van operasyonan dike Amerîka ye. Niha ka çiqas DAIŞ’î yan rêxistinên din li wir hene tam nayê zanîn. Lê Amerîka û Rûsya ji her kesî baştir dizanin. Diviya ev bên eşkerekirin û hesab ji Erdogan faşîst bihata xwestin. Lê tersê wê dibe. Erdogan dibêje Amerîka bi terorê re hevkariyê dike û agir ji devê wî dibeyî. Yên ku Erdogan ji wan re dibêje terorîst ew kes in ku bi Amerîka û Koalisyonê re li hemberî DAIŞ’ê şer kirine. Erdogan niha bi kuştina fermandar û şervanên QSD’ê ve mijûl e. QSD’ê li kû û li hemberî kê teror kiriye? Ev hêz li ser erdê xwe gelê xwe diparêzin û li hemberî DAIŞ’ê şer dikin. Ne xwe tenê, dinya tev ji van makîneyên kuştina hovane parastin.

Erdogan, bi awayekî stratejîk daniye pêşiya xwe ku ji Efrîn heta Dêrikê ango tevayiya herêmên Kurdan dagîr bike. Dixebite erdê welatekî din ji bo xwe bike ‘herêma ewle’ û ev ragihandiye. Li NY jî xistiye çavê wan dewletan de. Eger NY evqas kor, bêziman û kerr be, wê Erdogan jî evqas êrişkar be. Heman bela li ser başûrê Kurdistanê jî mûselet kirine. Herî dawî li Zaxo ciyekî geştiyariyê topbaran kirin. Di gel zarokan neh kes hatin kuştin. Dewleta tirkî li ser sûc hat girtin. Lewra ew de ciyekî dihat naskirin. Gerîla li wir tinebûn û şer jî li wir derneketibû. Erdogan di cî de dest bi inkarê kir.

Heta ku NY, Ewropa û Amerîka helwestekê diyar nekin wê Erdogan van sûcan bike. Tişta neyê fêmkirin ew e ku Rûsya û Îran bi vî êrişkar û dagîrkerî re li dora heman maseyî rûdinin û li ser Sûriyê bazarê dikin. Tişta bi Tirkiyê re bê axaftin derxistina wê ji Sûriyê ye. Heta ku êriş û dagîrkeriya Tirkiyê hebe li Sûriyê şer naqede û aramî nayê. Tirkiye dibêje ezê li bakur-rojhilatê Sûriyê bi kûrayiya 30 km milyonek koçberî bînim bi cî bikim. Hikumetek hêzeke wisa bi xwe re nabîne ku di hundirê welatê xwe de jî guhertineke wisa bike. Çawa selahiyetê bi xwe re dibîne li welatekî din vê bike.

Ya ku Tirkiyê evqas bêperwa û êrişkar dike siyaseta Îran û Rûsya ye. Amerîka û NATO jî her tim destê xwe dirêjî Erdoganê dijminê nirxên demokrasiyê dikin. Piştgiriya ku wî li ser piyan bigire didinê. Erdogan jî welatên erebî û Ewropa bi rêxistin terorê yên di destê xwe de tehdîd dike û koçberan weke çek li hemberî wan bi kar tîne. Yên destekê didin Erdoganê metirsiyê li dinyayê belav dike û bûye çavkaniya gefan, wê neçar bibin ku hesabê vê bidin gelên dinyayê.



# Bîlançoya 3 salan ya êrişên SÎHA, amûrên komkujiyê û Operasyona Sondê

Êrişên dagîrkeriya Tirkan yên bi SÎHA (balafirên bêmirov yên biçek) ji Kobanê dest pê kirin û heta niha dewam dikin, lê cîhan li hemberî vê rewşê bêdeng e. Dewlet jî bi firotina amûrên komkujiyê hevkarên sûc in. Ev amûrên komkujiyê kengê hatin çêkirin û bikaranîn, kî perçeyên wan difiroşe dewleta Tirkan?

Yek ji cûreyên şer ê herî tirsonek ew e ku bêyî şerê sing bi sing çeka sûîqastê ango amûra komkujiyê “SÎHA” ji aliyê dewleta Tirk a dagiker ve li ser hev û bê hesabxwestin li dijî welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê were bikaranîn. Yekemîn car dagirkeran bi hedefgirtina 3 jinên pêşeng li bajarê Kobanê ev amûrê komkujiyê bêyî şerê sing bi sing kir meriyetê.

## Pêşeng û paradîgma bûn amanc

Di 23 Hezîrana 2020`an de bi hedefgirtina endamên Kordînasyona Kongra Star a herêma Firatê Zehra Berkel, Hebûn Mela Xelîl û dayîka Emîne Weysî bi balafirên bêmirov ên biçek “SÎHA” re li bajarê Kobanê, dewleta Tirk a dagirker êrişên xwe bi rengekî din da destpêkirin û qonaxa êrişên bi rêbazê SÎHA/ÎHA`yan da destpêkirin. Her wiha dewleta Tirk a dagirker bi êrişa 16`ê Nîsana 2021`an ya bi SÎHA`yê mala rêber Abdullah Ocalan a li gundê Elpelûrê yê girêdayî Kobanê bombebaran kir, ku rêber Ocalan di 1979`an de cara yekmîn derbasî Rojava Kurdistanê bûye û 40 rojî tê de maye. Ev her du êriş li bajarê Kobanê ku bi taybet hatibû hilbijartin pêk hatin. Bi şehîdxistina jinên pêşeng yên Kongra Star û hedefgirtina mala rêber Abdullah Ocalan re dagirkeran hedefên xwe eşkere kirin. Ji wê rojê ve û heta niha di nav 3 salan de pêşeng û yên girêdayî paradîgmaya rêber Abdullah Ocalan têne şehîdxistin. Hilbijartina bajarê Kobanê jî ne tesadûfî bû.

## Qonaxa sîha/îha çima ji kobanê hate destpêkirin?

Di 15’ê Îlona 2014’an de Rojavayê Kurdistanê bi taybet jî Kobanê bû hedefa êrişên çeteyên DAIŞ’ê. Piştî vê rêber Abdullah Ocalan ji di 2-3’ê Cotmehê de bi HDP’ê û birayê xwe Mehmet Ocalan re hevdîtin pêk anî û li wir banga seferberiyê kir. Rêber Ocalan wê demê ev tişt gotin: “Li dijî DAIŞ’ê divê heta dawî berxwedan bê kirin. Gelê me yê Kobanê wê heta dawiyê li ber xwe bide. DAIŞ li ku derê lê hebe û li herêmê lê be, cihê Kurd lê dijîn, em ê heta dawiyê li ber xwe bidin. Ji DAIŞ’ê re tawîz nayê dayîn. Mafê kesî tune ku gelekî tine bike, divê Kurd li her derê li dijî vê siyasetê rabin, li dijî DAIŞ’ê berxwedaneke mezin nîşan bidin. Îro vê nekin, dibe ku sibe dereng be.”

## Kobanê ne tenê bajarek e!

Piştî banga rêber Abdullah Ocalan, ew Kobanê ya ku Erdogan ê faşîst digot ‘ha ket, ha dikeve’ bi berxwedan û seferberiyek gelek mezin di 26-27’ê Çileya 2015’an de hat rizgarkirin û destpêka têkbirina DAIŞ`ê anî. Vê serkeftinê hişt ku yekemîn deriyên dîplomatîk yên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li cîhanê vebe. Kobanê, ya ku derbeke mezin li qaşo “Dewleta Xîlafetê” xist û bû sembol, têkiliyên DAIŞ û dewleta Tirk raxist pêş çavên cîhanê. Bi dayîna berdelên giranbûha 1’ê Mijdarê Roja Piştgirîdayîna Kobanê ya Cîhanê hat ragihandin. Ji ber van destkeftiyên mezin ku dewleta Tirk a dagirker tehamûla wê nake, bi şêwazêkî tirsonek êrişên SÎHA/ÎHA`yan yekemîn li ser Kobanê da destpêkirin.

Gelo ev amûrê komkujiyê kengî hat çêkirin, kengî hat bikaranîn, kî perçeyên wê difiroşe dewleta Tirk?

## Amûrê komkujiyê li ser kurdan hate ceribandin

Çekên mîna SÎHA (amûra biçek û bêmirov a hawayî), cara yekem ji hêla Împaratoriya Awisturya ve hatiye bikaranîn û bi peymana ku di Konferansa Aştiyê ya Laheyê di sala 1899`an de hatiye îmzekirin, “derqanûnî” hatiye ragihandin. Tevî ku bi sedan sal li ser derbas bûne jî, qetlîamên li dijî sivîlan bi heman sûcên derqanûnî berdewam dikin. Dewleta Tirk ji sala 2016`an ve bi bikaranîna SÎHA’yan wek amûreke komkujiyê li dijî Kurdistanê bi taybet jî li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê, didomîne.

Piştî ku wezîrê parastinê yê Tirkiyê di 3’ê Îlona 2016’an de li ser hesabê xwe yê Twitterê ragihandibû ku yekemîn SÎHA`yên wan ketiye xizmetê, pê re êriş û hovîtiya dagirkeran li Kurdistanê bi şêwazekî din ket meriyetê. Dagirkeran ceribandina vê amûra komkujiyê “SÎHA” cara ewil li ser gelê Kurd pêk anî. Komkujiya Roboskî jî temê mînakeke wê ye.

Êrişên bi Dron, ÎHA û SÎHA heya niha ne ji aliyê dewletên kontrolkirina çekan a navneteweyî û ne ji aliyê mafên mirovan ve nebûye qanûneke navneteweyî.

## Almanya, brîtanya û dya hevkarê sûc in..

Ji ber wê dewleta Tirk a qirker bêtirs, bêhesabxwestin an darizandin van amûrên komkujiyê bi rihetî li dijî gelên Kurdistanê û welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi kar tîne. Cîhanê jî çavên xwe ji van komkujiyan re girtine û rola 3 meymûna girtine ser xwe. Ev dewlet ne ku tenê bêdeng in ji nedîtî ve tên, hemwextî wê perçeyên van amûrên komkujiyê jî difiroşin dewleta Tirk a dagirker û dibin şirîkên sûc.

Bi taybet Almanya di 3 mehên ewil ên sala 2021`an da bazirganiya çekan a bi Tirkiyeyê ra bi 8 milyon û 975 hezar euro, erê kir. Fîrmayên ku navenda wan Almanya, Brîtanya, Fransa, Awisturya, Kanada, Swîsre û DYA ne, hevkariya wan bi sûcên dewleta Tirk re derket holê. Dagirker perçeyên sereke yên SÎHA`yan ji 6 şîrketên DYA`yê peyde dikin.

## Sîha’ya ku pê pesnê xwe didin, nizanin çêkin, berhev kirine..

Ev SÎHA`yên ku dewleta Tirk dibeje “Ji sedî sed neteweyî û xwemalî ne” motorên wan ji Awisturyayê, kamera û amûrên optîkî ji Kanadayê, serê roket-fuzeyan jî ji Almanyayê tên kirîn. Ruxmî ku piştî êrişên dagirkeriyê yên li ser Serêkaniyê û Girê Spî ambargoya çekan li dewleta Tirk re danîbûn jî, lê heya niha Almanya roket û serê fuzeyan difiroşe Tirkiye. Lê li gorî qanûnên wan dewletan, ger di şer û êrişên ku hiqûqa navnetewî binpê dike de ev çek û teknolojî bên bikaranîn firotina wan qedexe ye.

## Bi dayîna koordînatan re hedef nîşan da

Dewleta Tirk a dagirker bi dayîna kordînatên SÎHA`yan gelek dibistan, nexweşxane, navendên ewlekariyê, meclîsên leşkerî, mal û erebeyên hemwelatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike hedef. Dagirkeran di êrişên li ser Efrînê de giranî dan êrişên SÎHA’yê, dîsa bi dayîna kordînatên SÎHA`yan di sala 2019’an de bi êrişên hewayî Girê Spî û Serêkaniyê dagir kirin. Lê bi dagirkirin û guhertina demografîk re jî sînor nema ku ev sê sal bênavber hemwelatiyan li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi SÎHA/ÎHA`yan dike hedef.




## Lehengên ku daiş têk birin, dike hedef

Dewleta Tirk di destpêka aloziya Sûriyê de çawa ku çeteyên El-Nusra û çeteyên DAIŞ`ê şand ser gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi têkçûna wan komên çeteyan re ew bi xwe ket dewrê. Pêşengên ku di têkbirina çeteyan de rolek mezin lîstin û mirovahî ji taritiyê û terorê xilas kirin, bi SÎHA/ÎHA`yên dagirkeriya Tirk tên şehîdxistin. Mînak Şehîd Hebûn Heleb, Hebûn Mela Xelîl, Dilar Heleb, Sosin Bîrhat, Rênas Roj, Berxwedan Kobanê, Kendal Rojava, Mizgîn Kobanê, Mizgîn Botan, Jiyan Tolhildan û Roj Xabûr û hwd. Dewleta dagirker ku bi cureyên şerê taybet, şerê dagirkeriyê tol hilneda, bi van êrişên asîmanî hewl dide tolê hilde. Koalîsyona Navneteweyî ku ji bo tunekirina DAIŞ derbasî herêmê bû, li hember hedefgirtina pêşengên ku DAIŞ têk birine çavgirtî û hevkar in. Çima?

## Qada hewayî ya bakur û rojhilatê sûriyê di destê kê de ye?

Helbet ev êrişên SÎHA/ÎHA`yan bê agahiya hêzên Koalîsyona Navneteweyî bi taybet Amerîka û Rûsya çênabe. Ji ber ku qada hewayî di destê wan hêzan de ye. Heya sala 2019`an rojavayê çemê Firatê di destê Rûsya, rojhilatê çemê Firatê jî di destê Koalîsyona Navneteweyî bi taybet jî Amerîkayê de bû. Piştî şerê Serêkaniyê û Girê Spî bi taybet xeta sînor ji Girê Spî heya Kobanê û Minbicê di destê Rûsya de ye. Qada hewayî ya herêma Cizîrê jî di destê Koalîsyona Navneteweyî de ye. Lê erka Koalîsyona Navneteweyî jî heye ku li wan cihan tevger bike. Di navbera Rûsya û Amerîkayê de lihevkirinek ji bo erd û asîmanê heye ku bi awayekî leşkerî neyên beramberî hev. Ji ber wê jî her balafireke dewleta Tirk li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê digere bi agahdariya hêzên Koalîsyona Navneteweyî û Rûsya ye.

## Yek bi yek tên girtin

Bêguman, di aliyê îstîxbaratî de ajan û sîxurên dewleta Tirk a dagirker jî agahiyan didin wê ku êrişên SÎHA`yan pêk bînin. Li ser şahadeta hevryên xwe yên pêşeng, QSD û YPJ`ê soza tolhildanê dabû. QSD li dijî sîxur û ajanan ên ku bûne sedema şehîdxistina hejmareke şervan û fermandarên pêşeng li seranserê herêmê di 31`yê Tîrmehê da “Operasyona Sondê” dest pê kirin. Di çarçoveya operasyonê de li bajarên Qamişlo, Til Temir, Hesekê, Şeddadê, Dêrazor, Reqa, Minbic, Til Temir û Kobanê 36 kesên ku di van şaneyên sîxurtiyê de cîh digrin hatin girtin.

## ‘Sondê’, heta girtina sîxurê dawî wê bidome

Sîxûrên ku hatine girtin destê wan di êrişa hewayî yên li bajarê Til Temirê ku di dîroka 19`ê Tebaxa 2021’an de pêk hatî hebû û bûbûn sedema şehadeta Fermandar Sosin Bîrhat, Egîd Girkê Legê, Rênas Roj û hevalên wan. Bi giştî bûne sedema şehadeta 6 pêşengan. Her wiha sîxurên ku destê wan de di şehadeta Fermandar Dilar Heleb û 2 hevalên wê ku di 20`ê Nîsana 2022’an de li bajarê Kobanê heye û ajanên ku di 20’ê Cotmeha 2021’an de bûne sedema şehadeta Şehîd Hecî û rêhevalên wî, hatine girtin. Operasyona QSD`ê ya li dijî sîxur û ajanên MÎT`ê heya girtina sîxurê dawî wê berdewam bike.

***ANHA***